Ciwanî, di hundir têkista edebî de geş dibe



Azad Dartaş

Heger erkê êkê yê feylesofî ew be, ku temaşeyî ketwarî bike û diyardeyekê yan komeka diyardeyên bi hev re girêdayî vexwîne û bi amraz, tîwr, peyrew, rêçike û awêzên xwe rave û şirove bike ji bo ku bigehîte rastiyan ku ew rastî jî bi xwe helgirên hinek yan rêjeka direwane, lê feylesof wan direwan paşguh dike û li ser lojîkek reha tev derencaman weku rastî li qelem dide; lê dibînim ku erkê helbestvanî, qurstir dibe û ji bilî erkê mêzekirin û xwendina ketwarî, helbestavan yê daxwaz kiriye ku yadigar û ezmûna xwe weku takekes ku endamê komeka civakî ya destnîşankiriye, bi awayek hunerî û estêtîkî bo ewên dî, yan bo me weku wergêr û xwendevan veguhêze, yan bi gotinek dî, bi yarî yeka zimanevanî wî keristey ewê di berdestên wî de bike kevalekê hunerî û di hişê me de cihgîr û berceste bike ku didemekî da ew derbirînê ji nax û hest û nestên xwe dike, di heman dem de dizane ku ew yê bi zimanek helbestî bi vî karî radibe çunke raste ew yê bi şirovekirina aso û rehendên mijarê radibe, lê bi zimanek cuda ji tev janrên dî yên edebî û staylên dî yên nivîsînê, aşop û durhêlî tevlîhev dike. Ew têkista helbestî ya serkeftiye ewa şiyaye xwe beriya her tiştekî ji zimanê vegêranê dûr bike û bi dîtineka ebstiraktîkî û estêtîkî wê mijar û doza li cem wî heye weku helbestvan, yan ew mijar û bîruka di hişê wî de ariyayî û dixwaze li dor bipeyve, bikare bi ceveng û hêma û risteyên helbestî pitir bi arîne û mijarê, bi tevaya pêkhat û keristên wêve, ber bi sentek dî bibe û weha li pêkhata han bike ku rindtir bibe û di ber çav û hişê me de dilvînek domdar de be, heta ew tiştên bê ruh û neliv û estatîk şiyana bizavtinê bide, heta wê radidê her êk ji wana bipeyvin û bo me wekû wergêr serbor û serhatiyên xwe vegêrin û bikare wê cîhanê bike keristek hest pêkirî ku mirov hest bike dê kare keristên han bi çavan bibîne û bi destan bigire û bi guhan bibihîse.. htd. Li vê derê jî berfirehiya cîhanbînî ya helbestvanî rolek giring radibe.

Xalek dî heye deqa helbestê ji deqên dî cuda dike yan bi gişt helbestê

ji janrên dî yên edebî cuda dike, ewe ku têkista helbestî gereke wergirî ber bi cîhanek bê sinûr û vekirî heta dûmahyê bi bet.. Hest biket wêneyên helbestê wî ber bi cîhanek dî dibe, her weha gereke risteyên helbestî her dem xwendevanî tûşî veciniqînê bike ku jê re dibêjin, veciniqîna wergirtinê, ev çende jî dirust dibe dema diristeyê de xwendevan yan wergir serhelî tiştekê çaverînekirî dibe. Bo nimûne risteya (xwînê bi destên min sor nekin) ya helbestvanê hêja mihsin qoçan, dibînîn ku tê de dîrokek dûr û dirêj xest bûye û xwendevanî hevrûşî veciniqînê dike çunke em li ser wê gotinê rahatîne ewa dibêje: (destên min bi xwînê sor nekin) ku ramana wê çendê dide ku min nevê ez kesekî bikujim yan beşdariyê di kuştina xelkekî de nekim yan dest nefreta xwe ji xwînê û kuştin û wêrankirinê dike û rengê sor divê risteya diwê de helgira ramanên wêrankare û dest ramana pak jî û dilpakiyê dide, lê helbestvan Qoçan hat û bi şehrezayî ve yarî bi riste û peyvan lêrahatina mêşkê me kir û cihên peyvan lêk guhurîn da ku raman û amajeyek nûgeh ji me re bibexşîne. (xwînê bi destên min sor nekin) weha vê risteyê vedixûnim ku destên me hind merg dost û kujekin û xwînê reng û delaletên xwe ji dest dayine û heger hevberî destên xwe bikin dibînîn ku rengê destên me ji ber kiryarên me yên hovane ji xwînê sortirin. Weha jî ji bilî çêj wergirtinê wergir dikare têramanek kûr di avahiyên wê de bike.

Bi tebayî gereke helbest weha li wergirî bike ku hest bike ew cîhana dî ewa helbestvanî di hişê wî de bercestekirî, cîhanek namoye û namo nîne bo wî di heman dem de, bi çend peyvên dî, ev halete ye biyavekî dirust dike ku dibêjnê biyavê tingijînê. Wergir, li vê dere mebesta me wergirê pozetîv û erênî ye, hest bike nemaze di xwendina piştî ya êkan de, ew cîhan di naxê wî de heye, di nav kûratiya kesê wî de heye, di hişê wî yê veşartî de bû.. Helbestvan şiya ewê cîhana veşartî û nixaftî bi efirandinekê serav û zelal bike. Helbet li vêrê sengî ya zimanê helbestê xoya dibe, helbest ew janirê edebî ewê şiyay tev janrên dî yên edebî bi hêz û dewlemend bike, pirsar ew e ew çi janirê nivêsînê ye mifa ji helbestê û ziman û ezmûna helbestê wernegirtibe? Heger ew gotin ewa dibêje: (niha serdemê mirina helbestê ye) ya rast be, li vêrê pirsiyarek dirust dibe, ew çi janirê dî yê nivîsînê ye ku bikare ew cihê helbest bi nemana xo vala dike, ew varêbûn û yaxîgerî û yarî bazî û namoyî û xoşî û çêj, ewên bi zimanê helbestê berceste dibin, di şiyanên wê de bin ku li hember van werçerxan û guhartina hembêzdar û dirêjipêder be, bikare di navbera peyv yankûyan de biyavekî peyda bike ku di wê biyavê de

herûher peyv ji ramanên xwe yên ferhengî û kehî û dûbarekirî yaxî û havî bibe, peyv û hêmayên helbestî çi caran di êk bazin de nezivire, belku di nûjenkirinek domdar de bijîn, helbest û zimanê helbestî şiyan bi dirêjehiya dîrokar her zimanekî tênek nûgeh bidenê û kiltur û ferhengê ji mendî û genîbûnê qurtal bike.. Peyvan bi çendên raman û wateyên û serdemiyane dewlemend bike.. Heger em temaşey romanê bikin weku zimanê bajêrî dibînîn, ew roman ya serkeftî û xwedî payeyek bilinde ewa tijî risteyên helbestî û heger evro hindek ziman gehayne lutka pêşkeftina xwe, ew zimanin ewên zor karê giran û qurs li ser hatiye kirin mîna zimanê îngilîzî û firensî û îspanî.. Htd. Heger ew gotina serî ya rast û dem serdemê mirina helbestê be, bo zimanek mîna zimanê kurdî, gotina henê gotinek lasayî û çavlêkere ku bo demê sedeha salaye li jêr dagîrikirinê de ye û zimanek qedexe bûye û bi tinê li biwarê şiîrê de karek li ser hatiye kirin û vî zimanî pêdivî bi dehan salên azadiyêye, divê karek rijd û xemxwer li ser bihê kirin heta bigehîte lutkeya xwe.. Vêca heger li wî demî ev pirse dirust bibe, çêdibe bibe cihê gengeşe û danûstandinê. Lê evro ev pirsiyare pirsiyarek kîvî û namo ye, nemaze bo zimanê kurdî her pirsiyarek zû û hêj ne demê wê ye. Zimanên dî eve bo demê sedeha salaye di ekadîmî, zanîngeh û melbendên zanistî de karek pirogram hembêz li ser hatiye kirin, berûvajî, zimanê kurdî karek weha li ser nehatiye kirin û ew derfet bo dirust nebûye ku di wî çarçovê pêdivî de werarê bi xwe ve bibîne, bi tinê eve 15 sale ku em dikarîn bibêjin me zanîngehên kurdî hene û me kesanên kurd hene bi rê ve dibin, lê niha jî em nikarin bibêjin ku bi eqlek kurdî têne birêvebirin, çunkû heta niha eqlê me tevan li jêr fişara gotara dagîrkerane. Heger zimanê kurdî werarek jî bi xwe ve dîtibe di çarçovê helbestê de bûye, bo êkemîn car têkistek hatibe nivîsîn, bi dîd û eqlek kurdî û bi peyvên kurdî û ji layê nivîskarek kurdî ve, şiîr bûye, her ji Baba Tahirê Hemedanê, Cizîrî, Nalî û Xanî.. Heta evro jî li pey dîtina me, şiîre dikare hembêza evan mercên henê bike, çunku şiîre bi tinê dişê retkirine va tev qalib û şêwaz û formên çarçovekirî û sinordayî bike, heger Mem û Zîna Xanî, weku nimûne werbigirîn, dibînîn ku rehendên dîrokî, siyasî, hizirî, sosyolojî, aşop, efsane, felsefe û hîkmet tê de hene û diwê dastanê da bo carên êkan bûye eqlê kurdî livîneka rabûngerane hembêz bike. Dikarim bibêjim ew livîn mîna qîjî û gaziyeka netewî bûye di naxê mirovekê kurd de helqiyaye û derkeftiye da jimera bibêje: Îro serdemê hişyarbûnê ye di hemû waran de.

Li wî demî mirov dikare bibêje ku serdemê şiîrê nema dema her

tiştek (dîrok, felsefe-kiltur-huner-çand. htd.) gehiştine dûmahiya xwe îdî me pêdivî bi van corên ciwankirin û hizirkirinê nema û eve jî gotin û gotarek ciyawazî kuje û tev danên evî serdemî weha diselmînin ku ev serdeme, serdemê ziqbûn û werara ciyawaziya ye, nahête pêşbînîkirin ku tev ciyawazî bihêne labirin yan di êk form û qalib de bihêne bihuştin, heger weha be, dibînim ku di cîhanek seyir û bê tam û çêj û ruh dê berpa be û em tev dê bîne fotokupyên hevdû û ev cîhana me ya xweş û pir tame bi hebûna evan ciyawaziyan û em tev dizanîn ku rojava mifa û çêjek pir mezin ji bînasazî, çand, huner û efsaneyên rojihelatê wergirtîne û bi dehan qatan em ji layê zanistî û teknelojî ve mifay ji eqil û destkeftên wan werdigirîn û dayeloga bajêrvanî bi vî awayî dirust dibe ku her êk bi taybetmendî û morikên xwe têkheliyan li gel hevdû bike.

Me diyar kir ku helbest ew janrê edebiye ewê dikare di nêvbera peyv û raman û delalatên wan dd biyaveka tingijînê birexsîne, ku di biyava henê de varêbûn dirust bibin, bibine egera varêbûnên avakar heta di warê hizirkirinê de jî û risteya şiîrî ew risteye ewa di hundirê wî de, hind peywendî di nêvbera peyvan de dirust bibin ku beriya guhdarîkirin û nemaze xwendina wê, xwendevanî weku wergir hestnekirbe ku ev têkhelî û hevbendiye di nêvbera wan de dirust dibin, li vê derê ziman geşê bi xwe ve dibîne û aşopa mirovî zîndî û berfirehtir dike û çêj û ciwanyê jimera dibexşîne.. Da ku pitir dirêjehiyê bi gotinên xwe nedin dibêjim, niha di wê bawerê de me ku heta ziman maye amrazê têkgehştinê di nêvbera te û ewên dî de, dê bi rêka zimanî hizir û çand û heta zanist jî geşê bi xwe ve bînin û di vê qadê de, helbest dimîne weku ciwan û rindtirîn janrê gotin û nivîsînê.

Dema me ev helbest û têkiste xandîn, me hewil dilîn xwendinên xwe jê re bikin, beriya nivîsînê me ta radeyek baş çêjek jê wergirtiye û bo demekî li gel peyv û riste û bîroke û wêne û kesanên wan jiyane û ev hokare bûyine egera paldana me ku têkstek dî li ser ava bikin û heger têkistên me nivîsîn di astê dahênan û efirandina nivîserê êkan de nebin, daxwaza lêborînî ji wan dikin û dibêjim eve êk ji xwendinên meye û dibe heger derfet heba me çendîn xwendinên dî jî jê re kiribane û dîsan dibe xelkek dî jî hebe ku xwîndinên kûrtir bo van têkistan hebin û bi nêrîn û layenek dinive vexwînin.

Her wesa daxwaza lêborînê ji hindek helbestvanên dî dikin ku derfet nebûye mirov li ser têkistên wan bi dirustî raweste û deqek dî li ser ava bike û bi raşkawî ve dibêjim hinek têkist hene di qada edebê kurdî de ku di şiyanên min de nebûne li ser bipeyvim.